

# HBTQ

## Mafên kesên HBTQ li Swêdê



Ev broşûr ji bo kesên HBTQ yên ciwan ku nû hatine Swêdê ye. Kesên HBTQ kesên homoseksuel, bîseksuel, transgender û queer in. Di broşûrê de dinivîse ka li Swêdê çi mafên kesên HBTQyê hene. Li dawiya vê broşûrê lîsteyeke rêxistin, daîreyên dewletî û malperên ku agahî, alîkarî û piştgiriyê didine kesên HBTQyê heye.

Qanûnên Swêdê li gor beyannameya Neteweyên Yekgirtî hatine saz kirin. Ev tê wê maneyê ku qedr û nirxê hemû mirovan li cem qanûnê weke hev e û herkes xwediyê eynî mafan e. Ji ber ku tu homoseksuel, bîseksuel, transgender an jî queer î kes nikare te tehdîd bike, li te bixe yan jî miameleyeke xerab li te bike.

## Daxwazkirina mafê penaberiyê

Eger ji ber ku tu kesekî HBTQyê yî li welatê te zordestî li te were kirin li Swêdê mafê te yê daxwazkirina penaberiyê heye. Girîng e ku tu di destpêka pêvajoya daxwaza penaberiyê de diyar bikî ka tu ji bo çi li Swêdê daxwaza penaberiyê dikî û ka li welatê tu jê têyî çi hatiye serê te yan jî tu tirs dikî ka çi yê bê serê te. Mirov dikare di nav sînorên welatê Swêdê de yan jî bi rêya Daîreya Koçê (Migrationsverket) daxwaza penaberiyê bike.

Eger ji ber ku tu kesekî HBTQyê yî li welatê te zordestî li te bê kirin û tu ji ber vê li Swêdê daxwaza penaberiyê bikî tu dikarî bi RFSL Newcomers re bikevî têkiliyê da ku tu di pêvajoya daxwaza penaberiyê de alîkarî û piştgiriyê bistînî.

## Evîn û têkilî

Mafê te ye tu kî bixwazî jê hez bikî û tu kî bî wisa bijî. Eger tu ji keseke/î hemcinsê te hez bikî mafê we heye hûn evîna xwe vekirî nîşan bidin. Eger te 18 sal dagirtibin bêyî ku cinsiyet (zayend) ferq bike tu kî bixwazî tu dikarî pê re bizewicî. Li Swêdê gelek kesên HBTQyê hene ku xwedî zarok in û mafê te heye tu ji bo çêkirina zarokan tedawiyê bibînî yan jî weke kesên din serî li ewladkirinê (adapsiyon) bidî.

## Seks

Bi şerta ku hemû kesên tê de bixwazin bêyî ku cinsiyet ferq bike tu kî bixwazî dikarî pê re seksê bikî. Kesên ji 15 salan mezintir nikarin bi kesên ji 15 salan biçûktir re seksê bikin. Ev ne qanûnî ye. Lê kesên ku 15 sal nedagirtine eger bixwazin dikarin bi hev re seksê bikin.

## Gava tu perwerdehiyê dibînî

Mafê te ye tu li dibistan û zanîngehê xwe di ewlehiyê de his bikî û tu çawa bî wisa tevbigerî. Ti kes, ne mamoste ne jî xwendekar dikarin ji ber cinsiyet, nasnameya te ya cinsî yan jî îfadekirina te ya cinsî miameleya xerab li te bikin, gotinên negatîv ji te re yan jî ji kesên HBTQyê te bibêjin.

## Wexta tu kar dikî

Weke li dibistanê li ser kar, cihê praktîkê yan jî dema tu serî li kar didî mafê te ye ku tu li dibistan û zanîngehê xwe di ewlehiyê de hîs bikî û tu çawa bî wisa tevbigerî. Ti hevkar an jî şef nikarin şîroveyên negatîv li cinsiyeta te, nasnameya te ya cinsî yan jî îfadekirina te ya cinsî bikin an jî gotinên negatîv li ser homoseksuel, bîseksuel, kesên transgender û kesên queer bikin.

## Gava tu li nexweşxaneyê bî

Nabe seksualîteya te, nasnameya te ya cinsî yan jî îfadekirina te ya cinsî tesîrê li tedawiya tu distînî yan jî li miameleya personelê nexweşxaneyê ya li ser te bike. Divê tu bi hurmet werî pêşwazî kirin û bi cidiyet li problemên te were nêrîn. Ji bo herkesê ku di xizmeta tenduristiyê de kar dikin mecbûriyeta sirveşartinê heye. Ev tê wê maneyê ku ew nikarin agahiyeke li ser te ji bilî kesên ku di xizmeta tenduristiyê de alîkariya te dikin ji kesên din re bêjin. Eger tu nexwazî ew nikarin tiştekî li ser te ji malbat, xizm an jî hevalên te re bêjin. Lê eger şika lêdana kesên ji 18 salan biçûktir a li malê hebe ew dikarin li cem xizmeta civakî (socialtjänsten) gilî bikin.

Testên nexweşiyên ku bi seksê belav dikin (STI) û testên HIV/AIDSê li Swêdê ji bo herkesî bêpere ango belaş in.

Ji bo kesên ciwan miayenexaneyên ciwanan (ungdomsmottagning) hene. Eger pirsên te li ser laşê te, li ser seksê û têkiliyên te hebin, an jî eger tu xwe baş his nekî û pêdiviya te bi axaftina bi kesekê/î re hebe tu dikarî biçî miayenexaneyên ciwanan. Ji 13 saliyê heta 20 û 25 saliyê tu

dikarî serdana miayenexaneyên ciwan bikî. Li ser malpera **www.umo.se** tu dikarî agahiyên têkiliyê yên miayenexaneya ciwan a nêzîkî te bibînî. li ser vê malperê herwiha gelek agahiyên li ser laş, seks, têkiliyan hene û mirov dikare bi awayekî anonîm ango bêyî ku navê xwe bêje pirsan jî bike.

## Ji bo kesên transgender ku dixwazin laşê xwe û cinsiyeta xwe ya hiqûqî biguherînin

Eger tu bixwazî laşê xwe biguherî da ku ew weke nasnameya te ya cinsî bibe tu dikarî alîkariya cerahî û tedawiya hormonan werbigirî. Ji bo vê pêşî divê tu lêkolîneke nasnameya cinsî bikî. Di lêkolînê de berî her tiştî divê tu bêjî ka tu nasnameya xwe ya cinsî çawa dibînî. Tu li kûdera Swêdê bijî mafê te yê lêkolîna nasnameya cinsî bikî heye. Qaîdeyên çûna miayenexaneya lêkolînên nasnameya cinsî li gor cihê ku tu lê dijî têne guhertin. Li gelek bajaran ji bo vê divê psîkiyatriya giştî an jî psîkiyatriya zarok û ciwanan (BUP) te hewale bikin. Li hin herêman miayenexaneyên ciwanan û doktorê malbatan dikarin te hewale bikin. Hîn bajêr hewalekirina xwe bi xwe jî qebûl dikin, yanî tu bi xwe bi dagirtina formulerekê miraceatê dikî. Ji bo tu lêkolîna nasnameya cinsî bikî divê tu li Swêdê qeydkirî bî, lê hewce nake tu hevwelatiyê Swêdê bî. Eger tu ji 18 salan biçûktir jî bî tu dikarî dest bi lêkolîna nasnameya cinsî bikî, lê ji bo hin tedawiyan û ji bo guhertina cinsiyeta hiqûqî divê te 18 sal dagirtibin. Eger weliyên te nexwazin jî mafê te yê wergirtina xizmeta tenduristiyê heye. Eger te li welatekî din dest bi tedawiya xwe kiribe xizmeta tenduristiyê ya swêdî dê li vir alîkariya te bike.

Eger bo mînak da ku li gor nasnameya te ya cinsî be tu bixwazî navê xwe biguherî tu dikarî bêyî ku serî li xizmeta tenduristiyê bidî û diyagnosekî werbigirî vê bikî. Ji bo ku navê te yê nû di belgeyên te yên nasnameyê de were qeyd kirin tu dikarî serî li Daîreya Bacê (Skatteverket) bidî.



## Xizmeta Civakî (Socialtjänst)

Socialtjäst li hemû şaredariyên Swêdê hene. Di hin rewşan de socialtjänt dikare alîkariyê ji bo peydakirina xanî û kar bike û herwiha desteka ekonomîk bide. Weke di hemû rewşên din de divê li socialtjänstê jî tu bi hurmet werî pêşwazî kirin, ev mafê te ye. Ew nikarin ji ber seksualîteya te, nasnameya te ya cinsî an jî îfadekirina te ya cinsiyetê te bi awayekî xerab pêşwazî bikin an jî şikan bibine ser van xalan.
Eger tu li xaniyekî ku socialtjänstê yan jî Daîreya Koçê (Migrationsverket) ji te re peyda kiriye bimînî divê tu xwe di ewlehiyê de û baş his bikî, bicihanîna vê berpirsiyariya van daîreyan e. Eger li xanî yan jî cihê ku Migrationsverketê ji te re peyda kiriye tu xwe baş his nekî girîng e ku tu vê ji Mifetişiya xizmeta tenduristiyê (Inspektionen för vård och omsorg - IVO) bêjî.

IVO hay jê heye da ku socialtjänt li gor qanûn û qaîdeyan tev bigere û xizmeta herî baş a mumkin bi cih bînin.

## Înternet û medyayên civakî

Qaîdeyên ku di civakê de lê ne li ser înternetê jî lê ne. Ev tê wê maneye ku kes nikare li ser înternetê heqaretê li te bike, te tacîz û tehdîd bike yan jî te ji aliyê cinsî ve tacîz bike. Kes nikare heqaretan li ser te û seksualîteya te binivîse. Herwiha kes nikare ji ber ku tu transgender î tiştên negatîv li ser te binivîse. Kes nikare te tehdîd bike, bi zorê tiştek cinsî bi te bike kirin an jî bi zorê wêneyan ji te bistîne. Kes nikare wêneyên ku tu naxwazî jî ji te re bişînin. Eger tu rastî tiştên wiha werî tu dikarî ji polîs re bêjî.

# Tu dikarî li vir alîkariyê werbigirî

## CIYÊN HEVDÎTINÊ YÊN HBTQ

### Newcomers Youth (Ciwanên nûhatî)

Newcomers Youth xebatekê ye ku berê xwe dide ciwanên nûhatî yên kesên hbtqi ne û ciwanên kesên hbtqi yên navbera 15 û 25 salî ku serî li mafê penaberîyê dane. Ew şewirmendiya hiqûqî, ciyên hevdîtinê yên bi ewle û atolyeyên xuliqkar pêşkêş dikin. Newcomers Youth ji alîye rêxistina ciwanan RFSL Ungdom ve tê rêvebirin. Ji bo te yê ku bi serîya 25 salî ye xebata bi navê RFSL Newcomers heye ku ji alîyê RFSL ve tê rêvebirin. Hem RFSL û hem jî RFSL Ungdom rêxistinên hbtqi yên dilxwaz in.

https://newcomersyouth.se

www.rfsl.se/en/medlem/asyl

### Transammans – federasyona kesên trans û merivên li nêzî wan

Transammans federasyoneke netewî ya ji bo kesên trans û merivên li nêzî wan e. Transammans sînorek ji bo emr (temen) daneniye. Ew herî zêde li ser medyayên civakî yên xwe çalak in, lê her weha li hejmarek ciyên li Swêdê qadên wan yên hevdîtin û aktîvîteyan jî hene.

www.transammans.se

# AGAHDARÎ Û ALÎKARÎ YA JI BO TU XWE BAŞ HÎS BIKÎ

## Vårdguiden – för frågor om sjukvården

(Rehbera tendrustiyê - Ji bo pirsên li ser xizmeta tendrustiyê)
Li ser malpera 1177.se Vårdguiden agahiya li ser xizmeta tenduristiyê ya Swêdê hatiye berhev kirin. Li wir dinivîse ka xizmeta tenduristiyê li Swêdê çawa dixebite, ka çi mafên te hene û ji bo problemên cuda tu yê serî li kû bidî. Eger tu tedawiya ku mafê te jê re heye negirî yan jî xerab werî pêşwazî kirin tu dikarî tu agahiyê li vir bibînî ka tu dikarî çi bikî.

www.1177.se/en/other-languages/1177-in-other-languages

## Youmo.se

Youmo.se malperek ji bo kesên di navbera 13 û 25 salan de ye. Tu li vir dikarî agahî li ser laş û beden, seks û tendrustiyê bibînî. Her weha li ser yeksanî, mafên xwe û ji bo xwe baş hîs bikî çawa alîkarî dikarî wergirî jî bixwînî. Li ser malpera Youmo dikarî li wêne û fîlman temaşe bikî û bi zimanên erebî, derî, somalî, swêdî yan tîgrînî bixwînî. Her weha dikarî agahîyên têkilîyê yên bi hemû miayenexaneyên Swêdê re jî li vir peyda bikî.

www.youmo.se

## Transformering.se

Li ser malpera transformering.se dikarî zêdetir agahî li ser tedawîya kesên transgender bibînî. Malper ji alîyê komeleyên RFSL och RFSL Ungdom ve tê rêvebirin. Li wir dikarî agahîyên li ser qaîdeyên derbas dibin bixwînî û herwiha tewsiyê, şîret û bersivên pirsên cuda yên li ser kesên transgender werbigirî.

www.transformering.se

### Pegasus – ji bo kesên ku bi pereyan seksê dikin

Eger te tecrûbeya te ya firotina seksê hebe û pirsên te li ser vê hebin tu dikarî ji bo agahî û destekê serî li Pegasûsê bidî. Firotina seksê tê wê maneyê ku tu ji bo seksê tiştekî werdigirî, bo mînak pere, narkotîka, alkol, mal (xanî) û tiştên cuda. Pegasûs malper û cihekî chatê ye ku ji aliyê RFSL Ungdomê ve tê bi rê ve birin, ku rêxistineke ciwanan e. Pegasûs ji bo ciwanên hbtqi yên navbera 15-25 salî ye.

**www.pegasus.se**

### HIV-Sverige (HIV-Swêd)

Hiv-Sverige komeleyeke dilxwaz e ku ji bo baştirkirina şertên jiyanê yên kesên ku hiv bi wan re heye dixebite.

**www.hiv-sverige.se**

## AGAHÎ Û ALÎKARÎ YA DI PÊVAJOYA DAXWAZA PENABERÎYÊ DE

### Migrationsverket (Daîreya koçê)

Daîreya koçê meqamekî dewletî ye ku li ser miraceatên kesên dixwazin li Swêdê bi cî bibin, werin serdanê, ji ber zordestîyê parastinê dixwazin yan dixwazin bibin hevwelatîyê Swêdê kar dike. Li vir dikarî agahî ji bo kesên hbtq ku daxwaza penaberiyê dikin peyda bikî.

**www.migrationsverket.se/Privatpersoner/Skydd-och-asyl-i-Sverige/For-hbtq-personer.html**

### Flyktinggruppernas Riksråd (FARR) (Encumenê Komên Penaberan-FARR)

FARR rêxistinek ji bo kesan û koman e ku ji bo bihêzkirina mafê penaberîyê dixwebitin. Li vir tewsîye û şîretên ji bo kesên daxwaza penaberiyê dikin jî hene.

**www.farr.se**



### Asylrättscentrum (Navenda Hiqûqî ya Penaberiyê)

Navenda Hiqûqî ya Penaberiyê (Asylrättscentrum) komeleyeke dixwaz e. Eger li derbarê pêvajoya daxwaza penaberiyê yan miraceata te de pirsên te hebin dikarî ji wan alîkarî bixwazî. Hîn caran ew dikarin li pêş meqaman temsîla te ya hiqûqî bikin. Navenda Hiqûqî ya Penaberîyê gelek caran bi wan kesan re eleqeder bûye ku ji ber nêrîna welatê wan ya li meyla wan a seksûelî, nasnameya wan a bi ser sînorên cinsîyetê ve û îfadekirina cinsî revîyane.

https://sweref.org

https://sweref.org/hbtq-personer-i-asylprocessen

## EGER MIAMELEYÊ XERAB DITIBÎ

### Polîs

Ji ber ku taciz, heqaretên cinsî, tehdîd û şidet sûc in divê li cem polîs jî werine gilî kirin. Eger ji ber seksualîteya te yan jî ji ber ku tu transgender î tu tûşî sûc werî ji ber ku ev sûcê nefretê ye cezayê wê girantir e.

www.polisen.se

### Socialtjänsten (Xizmeta Civakî)

Eger ji ber ku malbat an jî partnerê te te tehdîd dikin, li te didin yan jî bi awayekî din zordestiyê li te dikin tu bixwazî ji malê veqetî Socialtjänst ji bo peydakirina cihekî ewle alîkariya te dike. Socialtjänst meqamekî ye ku bi pareyên ji bacê tê fînanse kirin. Agahiyên têkiliyê yên Socialtjänstê li vir jî hene:

www.kollpasoc.se

## Diskrimineringsombudsmannen (DO) (Ombudsmaniya cudakariyê - DO)

Li gor qanûna cudakariyê nabe tu ji ber seksualîteya xwe, nasnameya xwe ya cinsî û îfadekirina xwe ya cinsî li dibistanê, li ser kar, di xizmeta tenduristiyê de û li cihên din ên giştî tûşî tacîz, heqaret, heqaretên cinsî, tehdîd û şidetê bibî. DO daîreyek e û hay jê heye da ku qanûna cudakariyê tê bi cih anîn. Eger pirsên te li ser cudakariyê hebin tu dikarî serî li ombudsmaniya cudkariyê bidî.

**www.do.se**

## Inspektionen för vård och omsorg (IVO) (Mifetîşiya xizmeta tendrustiyê)

Eger tu di xizmeta tenduristiyê de yan jî li Socialtjänstê xerab werî pêşwazî kirin tu serî li IVO didî. IVO daîreyeke dewletî ye.

**www.ivo.se**

## RFSL Beşa piştgiriyê

Beşa piştgiriyê ji bo te yê kesa/kesê hbtqi heye û ku tûşê heqaret, tehdît yan şîdetê bûye. Tu dikarî berê xwe bidî vê derê ji bo bi kesekî re biaxivî û eger tu tûşê tehdît, şîdet yan zordestiya seksûelî bûyî dikarî alîkarî werbigirî. Her weha meriv û dostên kesên hbtqi yên tûşê şîdetê bûne jî dikarin têkilî deynin. Beşa piştgiriyê ji alîyê rêxistina dilxwaz RFSL ve tê rê ve birin.

**www.rfsl.se/en/organisation/stod/rfsl-stodmottagning**

## Tjej- eller ungdomsjourer (Nobedariyên keç yan jî ciwanan)

Eger malbat yan jî partnerê te ji ber seksualîteya te, nasnameya te ya cinsî yan jî ji ber îfadekirina te ya cinsiyetê zordariyê li te bikin tu dikarî ji socialtjästê û ji nobedariyên ciwanan alîkariyê werbigirî. Ungdomjour li seranserê welêt li gelek deran hene û bo mînak dikarin di têkliyên te yên bi polîs, socialtjänst an jî xizmeta tenduristiyê re alîkarî û destekê bidine te. Beşek ji van nobedariyan tenê alîkariya keçan dike û beşek jî li ser pirsên homoseksuel, bîseksuel, transgender û queer pispor in. Unizon hemû nobedariyan kom dike û ji bo tu têkiliyê bi nobedariya rast re deyne alîkariya te dike.

**www.unizon.se**

## Fackförbund – för stöd i arbetslivet

Eger li ciyê kar yan wexta serî li karekî didî tûşî miameleya xerab hatibî dikarî ji sendîkayekê destek û alîkarî werbigirî. Sendîka ji bo endamên wan li jiyana kar miameleya baş bibînin dixebitin. Eger tu bixwazî tiştekî li cem polîs an jî ombudmaniya cudakariyê gilî bikî jî ew dikarin alîkariya te bikin.

**www.fackförbund.com**

# KURMANJI

**Beställ eller ladda ner materialet på:**

www.mucf.se/publikationer

Text: MUCF och RFSL
Foto: White Box Studios
Grafisk form: Strawberry Lake
Tryck: Tryckservice i Ängelholm AB
Kontakt: Myndigheten för
ungdoms- och civilsamhällesfrågor
Box 206, 351 05 Växjö
Telefon: 010-160 10 00
www.mucf.se

© 2021 Myndigheten för
ungdoms- och civilsamhällesfrågor

RFSL Ungdom

RFSL

mucf Myndigheten för ungdoms- och civilsamhällesfrågor